Zelamekî Şelel

Rojek ji roja ‘Îsaî ders digutine xelkî, hindek ji wan ferîsî [serukêt dînî] u mamostayêt desturî bîn. Ew xelke ji hemî gundêt Celîl u Yehudîê u Urşelîmê hat bîn u hîngê şîana Xudanî dîar bî da wana sax bikit.

Hindeka miruvek şelel [seqet] di nav nivîna da helgirti bî; ewan divîa bibine jur u danine ber ‘Îsaî. Demê ewan neşîaîn ji ber buşatîê biçine jur, îna birine ser banî u di nav bera li bina ra u li ser nivîna da hêlane xwarê, di nîva buşatîê da u li ber çavêt ‘Îsaî. Demê ‘Îsaî bawerîa wan dîtî, gut: “Ey miruv gunnehêt te hatine bexşandin [daqutandin].

Îna ferîsîa u mamustayêt desturî hizirêt xu kirin u gutin: “Eve kî ye axiftinêt bi gunneh dikit? Kî dişêt gunneha bibexşit [daqutit] heker Xwidê nebit?”

Belê ‘Îsaî zanî ew çi hizir dikin vêca bersiva wan da: “Hîn çi hizira di dilê xu da dikin? Kîşk bi sanahîtir e, heker bêjim, “Gunnehêt te hatine bexşandin [daqutandin]”, yan bêjim, “Rabe u bi rê ve here!”? Belê min ew tişt gut da hîn bizanin Kurrê Miruv li ser erdî şîana bexşandina [daqutandina] gunneha heye.” U gute ewê şelel, “Dibêjim te nivînêt xu hilgire u here mala xu.” U di cih da li pêş çavêt wan rabî u nivînêt xu rakirin u pesna [supasîa] Xwidê kir u çû mala xu.

Hemî guhişîn u tirsê girtin u pesna [supasîa] Xwidê kir u gutin: “Evru me tiştêt ḧinêr [bêbawerî] dîtin.”

- Mizgînîa Luqaî 5:17-26

“Jîn” guvareke tête nivîsîn ji laê Şirînê. Heker te jimara guvarê bivêt, îmêla xu bu min virêke: jeenuazadi@cs.com

© 2007 by Şirîn. All rights reserved. This publication may not be sold, except by the author. It is for free distribution only.